JIYANBÎNÎ

Hoşeng şêx Mihemed

MIROV

Mirov wek qehir, wek xem û hem, wek mihwerek bo babetên siyasî, edebî, komelayetî û rewşenbîrî bi giştî di kultura me de, hêş nebûye xem, qehir û ezab.

Ez dibînim bi sanahiye her kes bihêt û behsa dewleta kurdî bike... Her kes behsê hilbijartin, fîdiralî, serxwebûn, hikumet û dezgehên kurdî û şeqamên kurdî û destkevtên hemûcorên miletî bike. Nivîser hene bi sanahî dawiya hizrên Fokoyama û siyaseta welatên zilhêz û bihêz û biçûk şirove dikin, gelek rewşenbîr bi sanahî reh û rîşalên tîror û tîroristan ji bin toz û gemara tarîxê radikin û nîşanî me didin.

Gelek babetan dixwînim û hest nakim xudanê nivîsînê rastgo be, anku ew nivîsîn ezmûna wî ya kesokî û hizrî be, anku hest bi wî babetê bike wek babetek ku xwediyê wî pê dihese ne wekî em yên din.

Ew nivîsîn pitir nivîsînên temulên part û desthilata madî û menewî wî nivîserî, ji ber vê çendê jî dibînin bi dehan gotarên wek hev û ramanên mîna hev û gotarên şitî yek di demekê de pêkve ji dayik dibin. Pêwiste nivîser bi rengekî ji rengan hest bike, ew jî berpirs e li ser mosîbetên vê civakê û vê dunyayê..., û di xemê vê çendê jî be ka nivîsîna wî dunya miovan ciwantir lê dike yan kirêt tir, bê manetir lê dike yan dişêt bihayekî pê bibexşe?.

Bidaxwa ez dibînim hejmareke zêde ji nivîsîn û babetên belavkirî di rojname û kovar û heftînameyên kurdî de xwedan bihayên jiyandostiyê nînin, dehan gotar û vekolîn di rojekê de belav dibin û hest nakim ew gotar êşên nivîserî rakirbe û bi riya nîşandana wî êşa jiyana me rontir û xweştir lê bike, yan çemekekî bi rengekî nîzîk ji heqîqetê bo me bide xuyakirin, yan qehra mirovî niyasîbe û me jî bi wan qehran bide niyasîn û mirovan li hev nîzîk tir bike û baş tir li hev bikin û ciwan tir jî sewdayê di gel hev bikin û bi rastî jî bibine hevpişik di xema welat û nîştiman û bihayên jiyandostiyê û riha çalak û şolker û tijî hêvî û kar.

Ew nivîsînên ezaba mirovî li pişt nebin, xemên mirovî palder nebin bo rijyana rondikên pênivîsan hîviya ciwan bûn a jiyan û serkevtina rastiyan li pişt ranewistiyabin, neşên bibine xudan gotareke bihayên mirovatî û peyamên exlaqî.

Nivîsîn exlaq û rewişt û hizir û kesatiya nivîserî ye berî wêne û navê wî be, dîsan bi daxve, ez dibînim ta radekî jiyana jin û zelaman jî bûye heftînameyek yan kovarek yan salnameyeka bê hestkirin bi azarên hev... qehrên hevdu û ezabên yek; ji ber vê çendê jî neşên hevdu bixwînin û şirove bikin û di hev jî bigehin.

Pêwist e hemû gavan mirov di nav roha me de be, di demê nivîsînê, li malê û li her erdekî ku heta bê mirov jî be.